

Herêma Rojhilat û Rojhilatê Başûrê Anatoliyayê
BÎLANÇOYA KIRINA BIN PÊYAN A MAFÊ MIROVAN A SALA 2020'Î
-KURTE-

Di der heqê kirina bin pêyan a mafê mirovan de

Bi kuştina bi kêfî, kirina bin pêyan a rayeya bikaranîna çekê ya jî bi hinceta jê re hatiye gotin ku bisekine le nesekiniye;

Ji aliyê hêzên ewlehiyê ve 5 kes hatine kuştin, 10 kes jî birîndar bûne.

Di girtîgehên de 7 kesên jiyane xwe ji dest daye.

Dana ji dest a canê xwe ya 6 leşker û polîsan bi angaştên ku wan xwe bi xwe kuştîye bi guman e.

Di sala 2020'î de rêvebirekî partiya siyasî ji ber êrîşê jiyane xwe ji dest da, rêvebirekî partiya siyasî birîndar bû. 3 rojnamevan û 3 erkdaressên tenduristiyê ji ber êrîşên rû bi rû man birîndar bûn.

Li bajarên li herêmê di êrîşên bi çek ên hatine kirin de; 43 ewlehîkar jiyane xwe ji dest dane, 30 jê jî birîndar bûne. 218 mîlîtanên rêxistinî bi çek jiyane xwe ji dest daye. Sivîlek ku di nav pevçûnê de maye jî jiyane xwe ji dest daye.

Ji ber çalakîyên rêxistinî bi çek 15 kes jiyane xwe ji dest daye, 23 kes jî birîndar bûne.

8 kes, ji aliyê mîlîtanên rêxistinî bi çek ve hatine kuştin.

Li ser xetên sînoran 4 kesên bera wan hatiye dayîn jiyane xwe ji dest daye. 13 kes jî ji ber sermayê qerisîne.

Bi teqîna mayinan zarokên jiyane xwe ji dest daye, 2 zarok û 2 mêr jî birîndar bûne.

8 zarok, 37 jin û 10 mêr tev tevî hev, mirina 55 kesên bi şik û guman hatiye dîtin.

Kirinên bin pêyan ên mafê mirovan di atmosferaya bi pevçûnê de ev in;

4 bajar û 13 navçeyên li ser van bajaran û bi dehan deverên di sînorê van navçeyan de, 10 caran wek deverên bi ewlehiya taybet hatin ragihandin. Li hin deveran ragihandi bi periyodîk hatin dirêj kirin.

Li navendên 3 bajaran û 96 tax/gund û gundikên 8 navçeyên girêdayê van bajaran 13 caran kirina qedexeyê derketina ji derve hatin ragihandin.

Cendekê mîlîtanekê/î rêxistinî, bi rêya PTT'ê hat bi rê kirin ji bo malbatê.

Gor û goristanên mîlîtanên rêxistinî, qet nebe 8 caran hatin rûxandin.

Goreka bi komî ya hat payîn ku aîdê 40 kesan e hat dîtin.

Kirinên bin pêyan ên mafê jiyane yê jinan;

38 jinan xwe kuşt, 4 jin jî ketin hewla kuştina xwe. 34 jinan ji ber tundûtûjiya di nav malê de jiyane xwe ji dest da, 33 jin jî ji ber tundûtûjiya rû bi rû man birîndar bûn. Li 3 jinan rû bi rûyê destdirêjiya zayendî bûn. 17 jin ji ber tundûtûjiya di nav jiyana civakî de rû bi rû man jiyana xwe ji dest dan. 12 jin jî birîndar bûn ji ber êrîşa rû bi rû man. 17 jin rû bi rûyê destdirêjiya zayendî bûn, zor li jinekê hat kirin ku fuhûşê bike.

Kirinên bin pêyan ên mafê jiyane yê zarokan;

4 zarokan xwe kuşt, zarokek ket hewla kuştina xwe. Zarokek ji ber tundûtûjiya di nav malê de jiyane xwe ji dest da. 7 zarok birîndar bûn ji ber tundûtûjiyê. 2 zarok bi zayendî hatin îstismar kirin. 3 zarok ji ber tundûtûjiya di nav jiyana civakî de rû bi rû man jiyane xwe ji dest dan. 2 zarok rû bi rûyê tundûtûjiyê bûn li dibistanê. 5 zarok birîndar bûn. 217 zarok duçarê îstismara zayendî man.

Kirinên bin pêyan ên di der barê qedexe bûyîna êşkenceyê de

Qet nebe 12 kes di nezaretan de rû bi rûyê êşkence û miemeleya xerab bûn. 97 kes li cihê derveyê nezaretan (kuçe- girtina bi ser malan de) rû bi rûyê êşkence û miemeleya xerab bûn. 54 girtî, di girtîgehan de rû bi rûyê êşkence û miemeleya xerab bûn. Hêzên ewlekariyê li 13 kesan sixurî ferz kir, gef li 18 kesan xwarin.

Kirinên bin pêyan ên di der barê azadî û ewlehiya kesane de

16 jê zarok 1550 kes binçavî bûn.
2 jê zarok 310 kes hatin girtin.
Cezayê mayîna di malê de hat dayîn ji bo 22 kesan.
Bi ser 1345 mal/kargehan de hat girtin.

Kirinên bin pêyan ên di der barê serbestiya fikr, îfade û bi rêxistin bûyîna de

Ji ber fikr û ramanên xwe;
Di 29 dosyeyên lêpîrsînê de lêpîrsîn hat kirin di der barê 183 kesane de.
Di 17 dosyeyên dozan de doz hatin kirin li 119 kesane.
Ji 53 dosyeyan cezayê girtîgehan ên cur bi cur û yê pere hat dayîn ji bo 230 kesên di nav de siyasetmedar, rojnamevan û kedkar gel jî hebûn.

9 avahiyên partiyên siyasî, 2 komal û 3 avahiyên şaredariyê rû bi rûyê êrîş an jî girtina bi ser de bûn. Deriyê Kongreya Civaka Demokratîk ku pêkhatyêke siyasî ye bi talîmata dozgeriyê hat muhr kirin, kirinên partiyêke siyasî (Partiya Demokrat a Kurd) hatin rawestandî.

Hêzên ewlekariyê dest di 19 xwenîşandan ya jî civînên ji derve de werda.

Civîn ya jî xwenîşandan, li hin bajaran bê qewil, li hinan jî ji 15 rojan carekê ya jî bi nû kirina bi her mehê hatin qedexe kirin. Sala 2020'î 72 caran biryara qedexe kirinê hat ragihandin.

Kirinên bin pêyan ên di girtîgehan de

496 girtî bêyî hincet hatin sirgûn/sewq kirin.
69 girtî duçarê kirina bin pêyan a mafê tenduristiyê hatin.
Qet nebe 15 girtî duçarê tecrîd û îzolasyonê hatin.
Qet nebe di der barê 4 girtiyan de dest bi lêpîrsînê hat kirin.

Kirinên bin pêyan ên di der barê mafê aboriyî û civakî de

Di qezayên kar ên ji ber şertên bêewlehî bûn de; 18 karkiran jiyane xwe ji dest da, 2 karkir birîndar bûn. 418 karkir ji kar hatin avêtin. 46 kes ji erka xwe hatin kirin û 42 kes îxraç bûn. 3 xebatkarên gel hatin sirgûn kirin.

Erkdar kirina qeyûman ji bo şaredariyên HDP'ê berdewam bû. Sala 2020'î qeyûm ji bo 4 bajar, 8 navçe û bajarokan hatin erkdar kirin. Qeyûm hatin erkdar kirin di cihê 3 endamên Meclîsa Şaredariyê de, 21 endamên Meclîsa Şaredariyê û 10 endamên Meclîsa Bajêr ji erka xwe hatin kirin.

Agahiyên bi kitekit ên di der heqê daneyên qeyûmên ji şaredariyên HDP'ê yên salên 2019-2020'î di PÊVEK'ê 1'î de ne.

KOMALA MAFÊ MIROVAN - ŞAXÊ AMEDÊ

PÊVEK-1

MEZBATAYÊN NEHATIN DAYÎN	TEV TEVÎ HEV
Hevşaredarên Mezbatayên Wan Nehatin Dayîn	6
Endamên Meclîsê yê Mezbatayên Wan Nehatin Dayîn	51
Endamên Meclîsa Bajêr a bi Giştî yê Mezbatayên Wan Nehatin dayîn	4

KIRINA JI ERKÊ - ERK DAR KIRINA QEYÛMAN			TEV TEVÎ HEV
Şaredariyên Qeyûm Erkdar Bûn	Metropol	3	48
	Bajar	5	
	Navçe	32	
	Bajarok	8	
Hevşaredarên Hatîn Girtin	Ên Fermî	24	31
	Hatîn Hilbijartin		
	Hevşaredar	7	
Hevşaredarên Hatîn Bêerk Kirin			35
Endamên Meclîsê yê Hatîn Bêerk Kirin			82